

Hayraz ji mînakên serkeftî

- Danûstandinên digel kesayetiyên mînak ên serkeftî yên ji warên perwerdehî û pîşeyî
- Hişmendîya derbarê Stereotypan de û pêşxistina dîmena berevajî ji alîyê xwe ve
- Xurtkirina danûstandina di navbera nifşan de û dîaloga di nav civaka mazûvanî de
- Avakirina civatan ji bo ciwanên Kurd û yên din

Medîa û Tevnedeng

- Ji bo ciwanên Kurd û yên din semîner û komxebatên ji bo perwerdehiya şarezabûna medîayê
- Ji alîyê ciwanên Kurd û yên din çêkirina malper, vîdeo, muzîk û nivîsaran ji bo medîaya ser internet û çapkirî, herweha ji bo radioyê
- Pêşkêşkirina hevpar a berheman û lidarxistina çalakîyên xwecihî û herêmî ji bo pêkanîna hişmendiyê û danûstandina agahîyan
- Pêkanîna tora peywendiyê, belgesazî, şewirmendî û mijûldarî

⇒ Xurtkirina binavkirina xwe-bi-xwe ya erênî ya ciwanên Kurd

⇒ Xurtkirina têgihîştineke erênî ya tevnedengê di derbarê pirrengîya jîyana mişextên Kurd ên li Almanyayê



Bundesministerium
für Familie, Senioren, Frauen
und Jugend

Piştgirê Projeyê

Bervêder

John Brandi

E-Mail: john.brandi@navend.de

Souma Wahab

E-Mail: souma.wahab@navend.de

**NAVEND – Navend ji bo
Lêkolînên Kurdî**

**NAVEND – Zentrum für
Kurdische Studien e.V.**


Bornheimer Str. 20-22
53111 Bonn

Tel.: (0228) 65 29 00
Fax: (0228) 65 29 09
E-Mail: info@navend.de
Web: www.navend.de



NAVEND -
Zentrum für Kurdische Studien e.V.
Navend ji bo Lêkolînên Kurdî
Center for Kurdish Studies
Centre des Etudes Kurdes
ناوهندی لیکۆلینهوهی کوردی

MediaCoach



Ciwanên Kurd
digel
Mînakên Şareza û
Medîayê

Paşxaneya Projeyê

Gelek ciwanên ji malbatên koçber, weha neyînî tên binavkirin, ku “di dibistanê de ne serkeftî ne, krîmînel in û xwedî potansiyela tundrewiyê ne.” Bi taybetî jî ciwanên Kurd ên li Almanyayê ji vê binavkirina nebaş bêzar in, ji ber ku ew hertim di çapemeniyê de di çarçoveya pevçûnan de tên nîşandan. Ev navlêkirina nebaş, wê yekê gelek dijwar dike, ku ciwan xwe bi awayekî erênî bidin nas kirin.

Da ku ciwan bikaribin potansiyela xwe nas bikin, pêdiviya wan bi çî heye. Ciwan çawa dikarin di nav civaka ku ew tê de dijîn û mezin dibin, xwe wekî endamên çalak bibînin? Koçberên serkeftî, ku ciwan dikarin ji xwe re mînak bigirin, li ku ne?

Ciwan, bersivên balkêş ên van pirsan pirranî bi xwe peyda dikin. Herweha serpehatiyên kesên serkeftî jî dibin arîkar û wêrekî û azwerî didin ciwanan, ku nîşan bidin, ku ew berevajî wan navlêkirinên neyênî ne. Kurdên xwenda, serkeftî û pêşketî yên wekî parêzer û mamoste ji bo ciwanan dibin mînak. Ji ber ku, wan kesên mînak tevî hemû dijwarî û astengîyan jî, di dawiyê de karibûne xwe bigihînin armanca xwe.

Bi riya înternetê tevahiya cîhanê dibîne, ka ciwanên koçber li Almanyayê çawa dijîn. Xebatkarên TV û radyoyê dihêlin, ku mirov xwe bigihînin gelek kesên xwedî vê pêxemê.

NAVEND – Navend ji bo Lêkolînên Kurdî e.V. bi vê projeyê dixwaze platformekê pêşkêşî ciwanên Kurd bike. Em dixwazin, em bi hev re afirîner bibin û çalakîyan li dar bixin, xwe li ser înternetê nîşan bidin, bi hevdû re pêwendî deynin û jê re bibin arîkar, ku koçberên Kurd di tevedengê de bi pirralîbûn û pirrengiya xwe werin dîtin û nas kirin.

Civatên Ciwanan

Civatên ciwanan, ji bo projeya me qadên sereke yê xebatê ne. Li van civatan derfeta ciwanan çêdibe, ku bi hevdû re danûstandinê bikin û bi Kurdên serkeftî yên mînak re werin cem hev. Di van civatan de, ewê pirs werin kom kirin, kesên mînak werin vexwendin, fikrên ji bo medîa yan pêşangehan werin pêş xistin û bi hev re plansazî werin kirin.

Perwerdehî: Ciwan Medîasazî Dikin

Bi danûstandinên digel rojnamegerên profesyonel û xebatkarên medîayê, ciwan ewê bibin xwedî wê derfetê, ku ji bo medîayên cihê berhemên xwe çêbikin. Li vê derê dikarin gelek pirs werin bersivandin: Ez çawa dikarim çalakiyan li dar bixim? Hevpeyvîn çawa tên çêkirin? Torên civakî çawa dimeşin? Ez dikarim bala mirovan bikişînim ser berhema xwe? Ez dikarim çawa serkêşiya gotûbêj û axaftinan bikim? Li vê derê, emê bi van pirsan û bi gelek mijarên din ên xebatên medîayê re mijûl bibin.

Avakirina Pêşkêşkirinên Li ser Înternetê

Facebook û Youtube ji gelek platformên înternetê, bi tenê du mînak in. Li vê derê mirovên ji her çand û temenê dikarin peywendîyan deynin, danûstandinê bikin, bi hev re fikrên nû bi pêş bixin û xwe bigihînin raya giştî. Wêne, vîdeo û nivîsên li ser malperên înternetê, derfetên bêsînor pêşkêş dikin, ku mirov fikra xwe bi awayekî afirîner yan jî rasterast ragihîne. Bi wî awayî ciwan dikarin jiyana xwe bi derhenêriya xwe pêşkêş bikin, bêtî ku tê de klîşe û pêşdarezî hebin.

Di Cih De Lidarxistina Çalakiyan

Tevî torên ser înternetê divê di cih de jî têkilîyên rasterast werin danîn û li ser wê yekê fikrên pêşxistî werin amade kirin. Herweha, ewê cîranên ji taxê jî ji bo çalakî, gotûbêj yan jî pêşangehan werin vexwendin. Ji bo

dewlemendiya fikrên li ser teşeyên çalakiyên ciwanan, divê bi qasî ku ji dest tê sînor neyên danîn: Hûn dikarin sîyasetmedaran vexwînin gotûbêjên, ku ji xelkê re vekirî ne, hûn dikarin muzîk yan vîdeo nîşan bidin, dans yan şano pêşkêş bikin yan jî Talkshow amade bikin.

Danûstandina digel Rojnamegeran

Çendîn rojname, kovar, televîzyon û radyo derfetan pêşkêşî beşdarên ciwan ên projeyê dikin, ku cîhana medîayê nas bikin û tê de ji xwe re cihekî bibînin. Ciwan ewê bi rojnameger, medîasaz û pisporan bişewirin û ji wan arîkariyê bistînin, ka çawa dikarin berhemên karîger çêbikin. Li hember vê jî ciwan dikarin nêrîna mediasazan a derbarê pirrengîya civaka me de biguherînin û zelaltir bikin. Bi mînakên serkeftî, klîşeyên li ser koçberan ewê bi rexnegîrî werin nixandin û safî kirin. Herweha, nûnerên medîaya Kurdî û hevkarên wan ên Alman dikarin têkilîyan deynin yan têkilîyên xwe xurttir bikin. Bi vî awayî, ewê dîalokeke li ser têgihîştina ciwanên koçber dest pê bike, bi taybetî jî derbarê ciwanên Kurd de.

Materyalên Agahiyê û Tora Pêwendiyê

Heta niha, agahiyên taybetî derbarê koçberên Kurd de gelek kêmtir in, herçend Kurd yek ji mezintirîn komên koçber ên li Almanyayê pêk tînin. Ev valahî dikare bi pêşkêşkirin û dokumentasyonê were dagirtin. Wekî din, divê danûstandina navçandî û navnîfşî were hêzdar kirin. Divê torên pêwendiyê yên karîger bînin damezrandin, agahî demdirêj werin amadekirin û danûstandin were pêşxistin.